# all together
# hep beraber
# alle zusammen

ÊBERA LÎSTIKA HIŞÎ YA PIRZIMANÎ

## NAVEROK


- Li Ser Projeyê | 5
- Lîstika Hişî ya Pirzimanî | 7
  - Çarçoveya Giştî û Armanca Lîstikê | 7
  - Agahîyên Serekî yên Derheqê Lîstikê da | 8
  - Çawa Dihê Lîstin? | 9
  - Hêmana Pirzimanîyê ya di Lîstikê da | 10
  - Kî û Kî Dikarin Lîstikê Bilîzin? | 10
- Lîstik û Çalakîyên Cihêreng | 11
  - Pêşnîyazên Giştî bo Perwerdekaran | 11
  - Lîstik 1 | 13
  - Lîstik 2 | 17
  - Lîstik 3 | 19
  - Lîstik 4 | 21
  - Lîstik 5 | 23
  - Pêşnîyazên Min yên Lîstikê | 25-26
- Kunye | 27

**Piştgir û Birêvebirên Projeyê**

Projeya HEP BERABERê (HEMÛ PÊK VE – BI HEV RA), bi hevkarîya Anadolu Kültür û Landesweiten Koordinierungsstelle Kommunale Integrationszentrenê (LaKI) û piştgirîya Stiftung Mercatorê, di navbera salên 2017-2019an da pêk hatîye.

## LÎ SER PROJEYÊ

ÎNÎSÎYATÎFA HEVKARÎYA ELMANYA-TIRKÎYEYÊ DI WARÊ PIŞTGIRÎYA PENABERAN DA
ALL TOGETHER / HEP BERABER / ALLE ZUSAMMEN / HEMÛ PÊK VE

Înîsîyatîfa me li Tirkîye û Elmanyayê bi wê armancê derketîye holê ku bikare pêk ve bifikire li ser rêbazên kartêker yên avakirina civakîbûneka giştgir û wasiteyên pratîk yên alternatîf yên bi lihevkirina civakî ra guncandî dabîn bike li hemû warên ku zarok û ciwanên penaber û ne-penaber, yên xwedî rabihurîyên cuda yên sosyo-kultûrî, -bi taybetî li dibistanan- pêk ve lê dijîn.

Bi hêza ku me ji hevkarîya nêzîk ya Tirkîye û Elmanyayê ya xwedî rabihurîyeka kevin di vê mijarê da û ji fehma wan ya ji-hev-fêrbûnê wergirtîye, me bi du pirsên hevpar yên serekî da rêyê:

1. Ji bo em zarokên xwedî rabihurîyeka penaberî bi lez tev li jîyana civakî û perwerdeyî bikin û wan teşwîq bikin ku bibin beşdarên aktîftir, em dikarin çi cure materyalên fêrbûnê yên giştgir yên li gor pêdivîyên berbiçav yên meydanê bi pêş ve bixin?
2. Ji bo ku lihevkirina civakî wek qonaxeka dualî saz bibe û tevkarî lê bihê kirin, em çawa dikarin pêk ve naverokên xwedî navendeka kultûrî û hûnerî çêbikin ku armanca wan bikaranîna hevbeş ya hemû zarok û ciwanan be.

Di nav qonaxa du salan da, me zêdetirî 40 pisporî ji du welatan anîn cem hev û li ser van pirsiyaran em HEMÛ PÊK VE fikirîn.

**Beşdarên Me yên Projeyê**
Projeyê, komeka esasî ya xwedî gelek perwerdekar û aktorên civaka sîvîl çêkir û li derdora vê peywendîyeka xurt û berfireh danî. Perwerdeker, pisporên xizmeta civakî, mamosta, akademîsyen, pisporên perwerdeya ne-formel, psîkolog, perwerdekarên dramaya afirîner, pedagogên muzeyê, terapîstên hûnerê, muzîsyen û lêkoler yên ji Tirkîye û Elmanyayê hatin cem hev.

**Komên Me yên Xebatê**
Bi wesîleya civanên me yên di çarçoveya projeyê da, beşdarên me derfet peyda kirin ku mînakên baş yên di warê xwe da nîşanî hev bidin, pêk ve

çavderîyê bikin li ziyaretên meydanî yên cuda û ji hevûdin fêr bibin. Li gor warên pisporî û eleqeyê, 6 komên xebatê yên tematîk peyda bûn. Van komên xebatê fikirên xwedî navendeka perwerdeya kultûrî û pêşnîyazên çareserîya hevpar bi pêş da birin ku piştgirîya “pêk ve jîyan”ê xala serekî bû. Wan ev fikirên hevpar yên bikaranîna aktîf ya îfadeya hûnerî wekî muzîk, hûnerên performansê, resim, peyker, lîstik, dramaya afirîner, edebîyat, dansê, tevî miqatebûna li pêdivîyên babetên cuda, veguherandin berhemên şênber, amûrên perwerdeya alternatîf.

**Berhemên Projeya Me**

Berhemên ku piştî projeya HEMÛ PÊK VEyê derketine holê,

- nêzîktêdaneka rêxweşker bo fêrbûna giştgir qebûl dike û armanca wê tevlêkirina hemû zarokên penaber û ne-penaber e.
- alîkarî dike ku pirzimanî û cihêrengîya kultûrî wekî nirx û zengînîyekê bihê qebûlkirin û balê dikêşe ser hêza “perwerdeya ne-formel” ya di vî warî da.
- wasiteyên fêrbûna bi lîstikan destekkirî, yên afirînerîyê, yên bihêzkirina qabîlîyetên îfadeya şexsî û kolektîf û yên fêrbûna bi hemsalan destekkirî pêşkêş dike, bi vê wesîleyê kultûra pêk ve jîyanê di nav zarok û ciwanan da xurt dike.
- bixwebawerîya zarokên xwedî jîyaneka penaberî û koçberî xurt dike, nahêle ku di pêvajoya hînbûna derdora nû ya jîyanê ra ji mîrateyên xwe yên kultûrî biqetin, û tevî parastina peywendîyên bi mîrateyê ra, qadên nû vedike ji bo sazkirina peywendîyên nû.
- piştgirî dike ku zarok hem zimanên xwe yên malbatê hem jî zimanê civaka têda fêr bibin; gava ku vê dike, nêzîktêdanên nûxwaz yên perwerdeyê bi kar dîîne bi rêya kultûr, hûner û lîstikê.

Her komeka xebatê berhemeka hazir bo pratîka li meydanê pêk anî ku dibin mînak ji van prensîban ra. Berhemek jî ev kitêboka **LÎSTIKA HIŞÎ YA PIRZIMANÎ** ye ku niha di destê we da ye.

Hûn dikarin di ser navnîşana www.hep-beraber.orgê ra bigihîjin hemû berhemên projeyê.

# LÎSTIKA HIŞÎ YA PIRZIMANÎ

## ÇARÇOVEYA GIŞTÎ Û ARMANCA LÎSTIKÊ

Qebûlkirina zarokan ya melzemeyên perwerdehîyê û çalakîyên di warên cuda yên fêrbûnê da ji bo wan hatî pêşkêşkirin û xwe-wekhevgirtina wan bi van melzemeyan ra, xala herî girîng e ji bo fêrbûneka xurt. Xwe-wekhevgirtina bi melzemeyan ra, hêsankerîyeka mezin e di baldarbûn, eleqeya li ser melzemeyan û xwe-îfadekirina zarokan da. Wasiteyeka herî girîng ya pêkan jî, da ku her zarokek bikare alîyekî xwe di naveroka perwerdehîyê da bibîne, berçavkirina zimanên malbatî yên wê koma fêrbûnê ye di nav wê melzemeya perwerdehîyê da. Ev, hem dihêle melzemeya perwerdehîyê giştgir be hem jî dibe alîkar hîyerarşîya fêrbûna sedem-zimanî bihê têkbirin.

Koma Fêrbûna Pirzimanî ya girêdayî *Înîsîyatîfa Hevkarîya Elmanya-Tirkîyeyê di Warê Piştgirîya Penaberan da*, bi wê xeyalê daye rêyê ku tevkarîyê bike li tecribekirina cihêrengîya kultûrî û zimanî di lîstikên zarokan da, li berbiçavbûn, qebûl û fehmkirina pirzimanîyê di civakê da. Li ser vê xetê, çêkirina lîstikeka weha daye ber xwe ku dê zimanên cuda yên malbatî yên di civakê da berçav bike û bigire nav xwe û dê di qada fêrbûnê da cih bide cihêrengîyan; wekî format jî formata lîstika hişî ya girêdayî dîmenan bijartîye. Formata besît û nas ya lîstikê ji alîyê berdewamî û qaîdeyan ve, dibe wesîle ku hem qadên bikaranînê berfireh bibe hem jî pirzimanî bi rêya lîstikê bigihîje komeka berfirehtir.

Lîstikê bala xwe daye têmaya "Taxa Me" û bi dîmenên besît yên taxeka jirêzê û jîyana rojane hatîye çêkirin. Di sêwirandina dîmenan da, bi taybetî ji alîyê hêmanên sembolîk û kultûrî ve, hatîye dîqetkirin ku amaje bi cografyayeka dîyar neke.

Li ser kartan, peyvên zimanên cuda yên bergindî wê dîmenê hene. Lîsteya zimanên li ser kartan û di lîstikê da pêşkêşbûyî ji bo Elmanya û Tirkîyeyê hatîye cudakirin çunkî hebûna zimanên malbatî bi tarîxa koçberîyê ya wê civakê ra û bi pêvajoya wê ya tecribekirina koçberîya roja me ve peywendîdar e. Li ser vê esasê, pêşekî li wê ye ku zimanên cuda yên axêverên her du welatan bigire nav xwe û bibe alîkar bo pêdivîyên roja me.


Ji bilî zimanên li ser kartan, da ku lîstik di xebitîna digel komên cuda yên hedefkirî da bi awayekî guncandî bibe alîkar li pêdivîyên lîstikê, etîketên peyvan yên zimanên cuda hatine sêwirandin. Ev etîketên han û Lîsteya Zimanan hem di qutîya lîstikê da ne hem jî di malpera projeyê da bi awayekî online mimkin e bihên bikaranîn.

**Lîstika Hişî ya Pirzimanî;**

- ji alîyê geşkirina baldarîyê, kêfxweşkirinê, piştgirtina qabîlîyetên zanistî, lihevcivandina lîstikvanên xwedî rabihurîyên cuda yên kultûrî û civakî û xurtkirina peywendîyên civakî ve, dibe alîkar li warê perwerdehîya giştgir.
- piştgirî dike ku lîstikvan hay ji pirzimanîya derdora xwe hebin, hesas
- bin li cihêrengîya kultûrî, meraqdar bin li hember zimanên cuda û wan
- teşwîqî fêrbûna zimanan dike.

## AGAHÎYÊN SEREKÎ DERHEQÊ LÎSTIKÊ DA

- Ev lîstika qutîyan ya wekî lîstikeka hişî ya pirzimanî hatîye sêwirandin, herî pêşî lîstikeka hevberkirina dîmenan e.
- Di lîstikê 25 cot, bi giştî 50 kart hene.
- Dîmeneka bi xêzedestê li nav her kartê hatîye cîbicîkirin. Di lîstikê da cotek (2 heb) heye ji her karteka xwedî heman dîmenê.
- Têmaya lîstikê “Taxa Me” ye. Dîmen ji jîyana rojane ya kolanan hatine bijartin û xwedî hêmanên besît in.
- Li ser her kartekê 4 zimanên cuda hene, lewma li ser her coteka kartan bi giştî 8 ziman hene.
- Zimanên li ser kartan; **tirkî, kurdî (soranî), erebî, fransizî, kurdî (kurmancî), somalî, îngilîzî û zimanê derî** ye.




---

Lîstik di nav her cure fealîyeta perwerdeker ya formel û ne-formel da, misaîd e bo bikaranîna li atolyeyên zarok û ciwanan, li çalakîyên hevpar yên dê-bav-zarokan, li malê û dibistanê.

Di qutîya lîstikê da, li ser ETÎKETÊN ZIMANAN yên zeliqok, 14 zimanên dîtir jî hatine pêşkêşkirin. Ev etîket bi wê armancê hatine amadekirin: Heger di lîstikê da hewcehî bi bikaranîna zimanên cuda çêbû, hingê dê li ser kartan bihên zeliqandin û lîstik li gor pêdivîyê bihê guncandin. Etîketên vala yên zimanan jî ji bo wê yekê hatine çêkirin: Gava daxwaz hebe ku hejmara zimanan ya li ser kartan bihê kêmkirin yan jî gava hewcehî bi zimanekî derveyê etîketên zimanan çêbû.

- Di qutîya lîstikê da TABLOYA ZIMANAN ya mezin heye. 19 ziman li vê tabloyê hatine zêdekirin. Ji bo balkişandina li pirzimanîyê di qada fêrbûnê da, ev tablo çêdibe ku li cihekî ber çavê beşdaran bihê zeliqandin, hilawistin, cîbicîkirin.
- Wergera di zimanên cuda da ya peyvên ji bo kartên lîstikê, bi formata daxistinê li ser malpera projeyê ye. (www.hep-beraber.org)
- Ji bo hemû wergerên di lîstikê da, wergêran di zimanên xwe yên malbatî da wergerandine û bi hevkarîya herî kêm du wergêran ve peyv hatine kontrolkirin. Lêbelê di wergera hin zimanan da, ji ber rabihurîya tarîxî û civakî-kultûrî û herêma cografî, wergerên cuda derketine holê. Ji ber ne-mimkinîya daxilkirina hemû versîyonan li lîstikê, di amadekirina lîsteyên zimanan da hin werger/tercîh hatine derxistin.
- Di dema lîstikê da, lîstikvan dikarin tevkarîyê bikin derheqê peyvan û wergeran da û wergerên cuda pêşnîyaz bikin. Perwerdekar dikare vê pêvajoyê ji bo nîşandana cihêrengîya zimanan binirxîne. Dikare îfade bike ku peyv, gotin û telafizên cuda di encama pêvajoyên civakî da derketine holê û ev zengînî ne. Etîketên vala yên zimanan eynî bi vê mebestê hatine çêkirin da ku wergerên cuda yên pêşnîyazkirî li lîstikê bihên zêdekirin.
- Di qutîya lîstikê da hebek NEXŞEYA TAXA ME heye. Ev nexşe ji bo bikaranîna di lîstik û çalakîyên pêşnîyazkirî da hatîye sêwirandin.

### ÇAWA DIHÊ LÎSTIN?

- Kart hemû têra xwe dihên tevlihevkirin û lîstik dihê destpêkirin.
- Hemû kart, bi awayê ku alîyê biresim li binî be, bi awayekî belawela li ser maseyê yan erdê dihê danîn. Li gor tercîhê, pergala cîbicîkirinê dibe ku çarçikgoşe (rectangle) be.
- Lîstik herî kêm bi du lîstikvanan dihê lîstin.
- Di her tûrê da, lîstikvanek herî zêde du kartan dizivirîne, hewil dide cota kartê bibîne.
- Gava hevbera rast bibîne, radihije kartan û tûreka din jî dilîze.
- Heger hevbera rast nebîne, kartên vekirî cardin (bi awayê ku alîyê biresim li binî be) berevajî dike û dorê dide lîstikvanê din. Lîstik bi vî awayî dewam dike heta ku li erdê kart biqedin.

- Ji bo firehkirina giştgirîya lîstikê, qaîdeyên serekî û tempoya lîstikê bi xêzekê hatine vegotin û li qutîya lîstikê hatine daxilkirin. Armanca li vir ew e ku derfetên pêk ve lîstinê yên lîstikvanên komên nexwendî yên ji temenên cuda bihên zêdekirin, heger hewce kir lîstik bo qadên derveyê perwerdehîyê bihê veguhastin, ser meseleyê lîstina wê ya di nav malê da bihê hêsankirin.

## HÊMANA PIRZIMANÎYÊ DI LÎSTIKÊ DA

Hêmana pirzimanîyê, çêdibe ku bi awayên cuda bihê bikaranîn di lîstikê da.

- Lîstik, her wekî awayê ku li jorê hatîye terîfkirin, bi awayê lîstikeka hişî ya dîmenî dihê lîstin û ji bo her hevbera rast pêk ve li kartê dihê nihêrîn. Çêdibe ji lîstikvanan bihê xwestin ku wê peyvê bi zimanên cuda yên pê dizanin bibêjin. Heger lîstikvan bi zimanekî bibêje, çêdibe ji hevalên lîstikê bihê xwestin ku bi zimanekî cuda lê bibin alîkar.
- Çêdibe ji hemû lîstikvanan bihê pirsîn ka kes heye ku peyvê bi zimanên cuda bibêje yan tune ye.
- Dema lîstikê, gava wergêrek li qada fêrbûnê hebe, çêdibe ku peyv bi gelek zimanên din bihên gotin. Çêdibe alîkarî jê bihê xwestin ji bo ku peyvên li ser kartê nivîsandî bihên xwendin.

Armanc ne ew e lîstikvan wan peyvan bi hemû zimanan hîn bibin lê armanc ew e hay jê hebin ku qadeka jîyanê parve dikin, zimanên din meraq bikin û vê cihêrengîya di nav komê da wekî zengînîyekê bi nav û nîşan bikin.

Armanca Lîstika Hişî ya Pirzimanî ew e ku tevkarîyê bike li her cure xebata di warê lihevkirina civakî û perwerdehîya giştgir da. Bi vî awayî, di çarçoveya perwerdehîyên cuda yên bi kesên ciwan û gihiştî ra, çêdibe ku wekî wasiteyeka lîstikkirinê bihê bikaranîn.

## KÎ Û KÎ DIKARIN LÎSTIKÊ BILÎZIN?

Lîstik, wekî lîstika hevberkirina dîmenan (dîtina hevberên kartan), **misaîd e ji bo pêk ve lîstina her zarokên 4 salî û mezintir, kesên ciwan û gihiştî.**

Heger hêmana zimanî li lîstikê zêde bibe û daxwaz hebe ku wisa bi peyvan ra bihê xebitîn, -ji ber ku mimkin e agahîyên esasî yên xwendin-nivîsandinê hewce bikin- lîstik çêdibe ku bi lîstikvanên **6-7 salî û jê mezintir** ra bihê lîstin.

# LÎSTIK Û ÇALAKÎYÊN CIHÊRENG

Hûn dê di vê beşê da kartên lîstikê û çalakî û pêşnîyazên lîstikên afirîner bibînin ku mimkin e digel melzemeyên dîtir yên di qutîya lîstîkê da bihên lîstin. Ev pêşnîyaz misaîd in ku bi afirînerîya lîstikvan û perwerdekaran bihên şênkirin.

Hûn dê di kitêbokê da rûpelên "Pêşnîyaza Min ya Lîstikê" bibînin û lîstikvan dikarin pêşnîyazên xwe lê zêde bikin. Armanca vê ev e ku bi tevkarîya zarokan yan jî ya kesên rizadil û perwerdekaran, kitêboka lîstikê bibe cihê lîstikeka seraqet geşestendî û hejmara çêkirina çalakîyan bi heman melzemeyên lîstikê pêk ve bihê zêdekirin.

**PÊŞNÎYAZÊN GIŞTÎ BO PERWERDEKARAN:**

1. Hemû lîstikên li jêrê pêşnîyazkirî misaîd in bi awayên komên biçûk li her qadeka fêrbûnê bihên lîstin. Berî destpêkirina lîstikan, dê hin xebatên we yên hevnasîn û germijanê yên alternatîf hebin li gor sedema ku ka hûn berê bi lîstikvanan ra xebitîne yan na. Ev xebat bi awayekî zêde dê maweya motîvasyon û konsantrasyona komê zêde bike, dê bibe alîkar ku dînamîkên muhîm ji bo derdora lîstikê cîbicî bibin, wekî "bawerîya bi hevûdin" û "peywendîdanîna bi melzemeyê lîstikê ra" di komê da,
2. **Birêvebirê çalakîyê, ne mecbûr e zimanên li ser kartan yan jî yên di Lîsteya Zimanan da bizane** ji bo ku lîstikê bide destpêkirin. Bereksê vê, ew bi xwe jî dikeve şûna "kesê fêr dibe" û fedî nake ji lîstikvanên zana yên van zimanan bipirse, alîkarî ji zarokan bixwaze. Her weha gava hewcehî pê çêbû, LÎSTEYA ZIMANAN bi kar diîne ji bo ku li peyvan binihêre. Heger derfet hebe, birêvebirina çalakîyê tevî wergêrân dê xebatê zengîntir bike.

**Pêşnîyazên Germijana Berî Lîstikê:**

Têmaya Lîstika Hişî ya Pirzimanî û xala focusê ya xêzan, "Taxa Me" ye. Berî lîstikê, çêdibe ku li dor vê têmayê bi koma hedefkirî ra xebatên curbicur yên germijanê pêk bihên.

**Berî ku qutîya lîstikê vebe:**

Berî ku qutîya lîstikê vebe, çêdibe bi pirsîyarên nedîyarkirî (*open-ended*) xebatên tematîk pêk bihên.

"Em çi li taxa xwe dibînin?"

"Li taxa me wekî din çi hene ku me nedîtine?"

"Li taxa me kî hene? Em bi kê ra dijîn?"

"Li derdora xwe em bi kîjan candaran ra qadeka jîyanê ya hevpar parve dikin?"

"Em dixwazin çi li taxa xwe bibînin?"

"Heger em bixwazin kesekî, heywanekî yan jî karakterekî dawet bikin ji bo ku li taxa me bijî, em dê kê dawet bikin?"

“Heger me bikarîya li qadeka vala ya taxa xwe pêk ve tiştekî lê bikira, me dê çi lê bikira?”

Bi van pirsîyarên nedîyarkirî û yên wekî van, mimkin e rêya axaftinê li qadên jîyanê û jîyanên rojane yên lîstikvanên komê vebe. Fikirînên şexsî û hevpar yên li dor wê têmayê çêdibe bihên teşwîqkirin.

Xebatên xêzê yên li dor heman pirsîyaran û bipêşxistina van xebatan bi xêra bikaranîna xêzên di kartên lîstikê da, dibe ku rê li ber zengînîyekê veke.

### Hevnasîn bi rêya Kartên Lîstikê

Berî hevnasîna lîstikvanan bi rêya kartên lîstikê, kart (hebek ji her hevberê) berî destpêkirina lîstikê bi wî awayê vekirî li ser maseyê dihê cîbicîkirin ku berê alîyê wê yê biresim li jorê be. Pirsîyarên nedîyarkirî dikarin bihên kirin heger peyvên li ser kartan “peyvên serekî” bin. Mînak;

Karta **Derî**yî bihê bijartin û “Bi ya we ev derî bi ser kû ve dibe?”

Karta **Balinde**yê bihê bijartin û “Bi ya we ev balinde li kû dijî?”

Karta **Peyabihur**ê bihê bijartin û “Bi ya we ev kesên li peyabihurê hevûdin nas dikin?”

Karta **Rawestgeha Otobusê** bihê bijartin û “Gelo ev kes ber bi kû ve diçin?”

Karta **Dar**ê bihê bijartin û “Darên taxa me herî zêde li kû ne?”

Kartên **Telefona Destan** û **Îtfaîye**yê pêk ve bihên bijartin û “Gava agir derkeve, em telefonî kîjan nimareyê dikin û gazî kê dikin?” bi pirsîyarên mîna van çêdibe bihê xebitîn û lîstikvan bi rêya kartan hevûdin nas bikin. Gava asta pirsîyaran bihê dîyarkirin, miheqeq divê pêş-zanîn (hazır bulunuşluk) û astên zanyarî yên lîstikvanan bihê berçavkirin.

Heger cihêwazîyên mezin hebin di navbera qabilîyetên peywendîdana devkî bi zimanekî hevpar yê lîstikvanan da, alîkarîya wergêran çêdibe ku bihê xwestin. Heger derfeteka weha tune be, çêdibe ku rêbazên kêmtir girêdayî gotinê yên wekî muzîk, xêz û niwandinê bihên tercîhkirin.

### Dema Lîstinê:

- Birêvebirê çalakîyê di dema lîstikan da, heta dikare lîstikvanan han dide ku alîkarîyê (alîkarîya hemsalan) ji hevûdin bixwazin, pirsîyarên derheqê mijarê da ji hevûdin bikin, bikevin nav peywendîyekê.
- Dema lîstinê ji bo ku konsantrasyon xira nebe û lîstikvan guh bidin hevûdin, birêvebir dikare kartên bi hevbera rast (cotên kartan) hilde destê xwe û nîşanî her kesî bide û bi bîrxistkên (çağrışım) “konsantrekirin”ê car caran rê bi ber lîstikvanan bixe.
- Pêşnîyaz e ku TABLOYA ZIMANAN ya di qutîyê da, li dîwar yan jî rûbereka (bilind bi qasî ku zarok bibînin) qada fêrbûnê bihê zeliqandin û tim li ber çavan bihê girtin.
- Di çalakîyeka tevî kartên lîstikê da, heger reftara çalakîyê misaîd be ji vê yekê ra, tekrarkirina peyvan bi dengê bilind di zimanekî yan jî çend zimanan da ji alîyê birêvebirê çalakîyê ve dihê teşwîqkirin.

## LÎSTIK 1: EM LI TAXA XWE DERKEVIN GERÊ

*Armanc:*

- Jibîrnekirina peyvên fêrbûyî: Tekrarkirina peyva di karta hevber da bi zimanên cuda
- Xurtkirina ruhê xebata komî, zêdekirina qabilîyeta biryargirtinê ya hevpar
- Sazkirina hevokên xwedî wan peyvan, nivîsandina metineka kurt ji alîyê hemû komê ve

*Kî û Kî Dikarin Lîstikê Bilîzin?*

- Her kesê ku temenê wan 6 sal û zêdetir dikare bilîze.
- Herî kêm divê 4 lîstikvan hebin ku 2 kom çêbibin.


*Melzeme:*

- Nexşeya Taxa Me ya di qutîya Lîstikê da
- Kaxezên biçûk yên rengîn bi du rengan ku bikarin her du koman temsîl bikin. Ev melzeme dibe ku melzemeyeka din jî be ku bi rehetî dikarin peyda bibin. Herî kêm divê 25 heb ji vê melzemeyê hebin ji bo her komê.
- Kartên lîstikê
- Kaxeza vala û qelem


*Lîstik Çawa Dihê Lîstin*

- Lîstikvan dibin du kom. Her kom melzeme/kaxezên biçûk yên rengîn dibijêrin ku wan temsîl dikin.
- Nexşeya Taxa Me bi awayekî vekirî li ser maseyê dihê danîn. Xêzên di kartan da li ser nexşeyê hatine cîbicîkirin. (Xala destpêkirinê û guzergeh di vê lîstikê da ne muhîm in.)
- Kartên hişî dihên tevlihevkirin û hemû kart bi awayekî girtî jixwebere li
- ser maseyê dihên danîn.
- Çêdibe ku bi lîstika kevir, kaxez û meqesê bihê dîyarkirin ka kîjan kom dê dest pê bike
- Lîstika hevberkirinê bi kartên hişî dihê lîstin: Bi dorê lîstikvanekî her komê, lîstikê dilîze. Lîstikvan du kartan dizivirîne, heger cota hevkartê bibîne, ew kom bi lîstika xwe dewam dike; lê heger nebîne, dor dihê ser koma din. Di her guherîna tûrê da, zarokên cuda di koman da dilîzin û bi vî awayî her kes bi dorê di lîstikê da cih digire.
- Çêdibe ku alternatîfek yan jî çend alternatîfên li jêrê li pey hev bihên
- tetbîqkirin ji bo her cota rast (hevkart) ya ku lîstikvan dibîne:

# TAXA



# A ME



1. Hevalên komê, peyva li ser kartê bi deng û bi zimanên cuda dibêjin û pêk ve tekrar dikin.
2. Kom pêk ve, hevokeka xwedî wê peyvê saz dike. Mînak, “Pisîkek li rawestgeha otobusê radize” ji bo karta Rawestgeha Otobusê, “Sibehê em dê birayê min bibin ser textorî” ji bo karta Textorî, “Duhê li parka zarokan me xwe ji şematokê şemitand” ji bo karta Parka Zarokan, “Em dixwazin sehayeka futbolê ji bo taxa me bihê çêkirin” ji bo karta Sehaya Futbolê, hwd. Biryargirtina hevpar ya komê li ser hevokê dihê piştgirîkirin.
3. Piştî ku kom hevokê dibêje, lîstikvanek melzeme/kaxeza rengîn ya temsîlkera koma xwe dadine ser heman dîmena di Nexşeya Taxa Me da.
4. Kesekî ji komê, hevokên wê komê li pey hev li kaxezekê dinivîse. Ji dêleva zarokan, birêvebirê çalakîyê jî dikare binivîse.
5. Zarok bi kîjan zimanî bixwazin dikarin bi wî zimanî van hevokan saz bikin. Çêdibe ku ji wergêrî alîkarî bihê xwestin ji bo hevokan binivîse yan jî heman hevokê bi zimanên cuda bibêje û mimkin e ku bi wan zimanan jî binivîse.

- Heger kartên li erdê biqedin, êdî hemû hevber hatine dîtin. Heger rêbaza hevok-sazkirinê hatibe tetbîqkirin, her du koman jî dê metineka kurt derheqê “Taxa Me” da nivîsandibe.
- Koma zêdetirî xwedî rengan li ser Nexşeya Taxa Me pêşekîyê werdigire û hevokên xwe yên nivîsandî li pey hev dixwîne. Piştra koma duyem hevokên xwe yên nivîsandî dixwîne. Ev metin, li gor hevok-sazkirina lîstikvanan, dibe ku hevokên li pey hev yan jî yên qutbûyî bin.
- Metin, li gor hevok-sazkirina lîstikvanan, dibe ku bi awayê metinên
- pirzimanî bin.
- Her kom dikare kaxeza ku metina wê li ser nivîsandî bi reng bike û metin çêdibe ku di qada fêrbûnê da li panoyekê bihê hilawistin.
- Gava ku lîstik biqede, lîstikvan radibin ser pêyan, kom bi zimanên cuda spasîya hevûdin dikin yan jî hevûdin bi zimanên cuda pîroz dikin.

## LÎSTIK 2: HAYDÊ EM TAXA XWE XÊZ BIKIN!

*Armanc:*

- Piştgirîkirina fêrbûnê bi xêzan: Qalkirina peyvên di kartan da bi rêya xêzkirinê, fêrbûna peyvan
- Jibîrnekirina peyvên fêrbûyî: Gotin û tekrarkirina peyva di karta hevber da bi zimanên cuda
- Xêzkirina resimekî hevpar yê Taxa Me tevî koma lîstikê

*Kî û Kî Dikarin Lîstikê Bilîzin?*

- Her kesê ku temenê wan 7 sal û zêdetir dikare bilîze.
- Çêkirina komê ne mecbûrî ye. Herî kêm divê 3 lîstikvan hebin ji bo ku lîstik bi kêf bidome.
- Heger lîstina bi komî bihê xwestin; herî kêm divê 4 lîstikvan hebin ku pê 2 kom çêbibin.

*Melzeme:*

- Kaxezeka mezin ya vala: Muhîm e ku hemû lîstikvan xêzên xwe li heman kaxezê çêbikin û rehenda kaxezê jî têra xwe mezin be. Heger tevî kaxezên biçûk xebitîbin, piştî çalakîyê çêdibe ku ev kaxez bihên pevvekirin.
- Qelemên boyaxa rengîn (Tercîhen qelemên boyaxa hişk dihên pêşnîyazkirin.)
- Kartên lîstikê

*Lîstik Çawa Dihê Lîstin?*

- Hemû kartên hişî bi awayekî girtî û çawalêhato dihên danîn. Armanc ew e ku lîstikvan hema ji nav wan kartekê bibijêre (bêyî ku kartê nîşanî kesî bide), peyv/dîmena di kartê da li kaxeza vala xêz bike û ji lîstikvanên din ra qal bike. Armanca lîstikvanên xêzker ew e ku peyvê bi awayê herî baş xêz bikin û ya lîstikvanên din jî ew e ku texmîna rast bidin.
- Birêvebirê çalakîyê, bi taybetî divê dîyar bike armanca talî ya lîstikê ne qezenckirin lê derxistina holê ya resimekî hevpar yê Taxa Me ye, lewma jî divê balê bikêşe ser girîngîya xêzan ji bo ku bi qelemên rengîn yên cuda li ser heman kaxeza mezin çêbibe.
- **Maweyek dihê dîyarkirin ji bo xêzkirinê.** Ev mawe di komên salmezintir da, çêdibe ku wekî maweyeka di navbera 15 û 30 sanîyeyan da bihê dîyarkirin. Salên (nîvekîya salan) lîstikvanan çiqas biçûk bibe, maweya ji bo xêzkirinê çêdibe ku bihê zêdekirin. Maweya dîyarkirî divê

ji bo her lîstikvanan eynî be. Li gor vê, divê maweya teqrîbî ya xêzkirina lîstikvanê herî salbiçûk yê komê bihê berçavkirin û mawe bihê dîyarkirin.

- **Lîstikvanê xêzker, di maweya dîyarkirî da xêzê çêdike berî ku nîşanî kesî bide û bi fermana "Veke" ya di dawîya maweyê da, xêzê nîşanî kesên din dide.**
- Kîjan lîstikvan herî zû peyva rast texmîn bike, heqê xêzkirinê yê tûra din bi dest dixe. Bersivderê herî zû heger ne xwedî bersiva rast be, heqê texmînkirinê dikeve dest her kesî. Heta bersivdana rast, lîstikvan dikarin texmînan bikin. Kîjan lîstikvan peyva rast peyda bike, ew kartekê ji erdê dikişîne û wê li ser kaxezê xêz dike. Lîstik heta ku kartên li erdê biqedin, bi vî awayî dewam dike.
- Kaxeza ku xêz li ser in, heta mimkin be tim eynî kaxeza mezin e. Bi vî awayî di dawîya lîstikê da, "Taxa Me" ji alîyê hemû lîstikvanan ve bi awayekî kolektîf dihê xêzkirin. Ev xêz, çêdibe ku li cihekî bilind –bi qasî ku her kes bibîne- yê qadeka fêrbûnê bihê nîşandan.

**Pêşnîyaz bo perwerdekaran:** Lîstikvan di dema texmînkirina peyva xêzbûyî da, dibe ku li hev nekin li ser meseleya ka kî pêşî peyva rast gotîye. Dibe ku rewşinên weha biqewimin ku dudilî çêbibe bê ka dor dê bihê ser kê di nav du lîstikvanên bersivder yên di heman kêlîyê da. **Birêvebirê çalakîyê çêdibe ku li vir çareserkirina pevçûnê ji lîstikvanên komê bi xwe ra bihêle.** Birêvebir dikare nîqaşa komê bi rê ve bibe, bi feedbackên erênî hevsengîya nav komê û dînamîkan berçav bike û biryarê ji wan ra bihêle ji bo ku biryareka hevpar bihê girtin bê ka dor dê di nav du lîstikvanên xwedî peyva rast da bihê ser kê.

**Pêşnîyaz bo perwerdekaran:** Çêdibe ku hin lîstikvan texmînên xwe bi zimanên cudatir bibêjin. Di vê rewşê da, birêvebirê çalakîyê dikare lîstikê bi awayekî cudatir bide destpêkirin. Ji dêleva ku lîstikvanan yek bi yek bide lîstandin, wan dabeşî koman dike. Komek xêz dike, komên din jî hewil didin bizanin. Bi vî awayî, lîstikvanên heman komê dikarin di meseleya texmînkirinê da alîkarîya hevûdin bikin. Dihê xwestin ku koma bi peyvva rast derxistî, wê peyvê bi çend zimanan bibêje; bi vî awayî zimanên dîtir yên di komê da jî dihên bihîstin. Dora xêzkirinê derbasî koma xwedî bersiva rast dibe.

**Pêşnîyaz bo perwerdekaran:** Ji alîyên dînamîkên lîstikê ve dihê xwestin ku armanca bidestxistinê derkeve pêş, û heger rewşên misaîd ji bo vê yekê jî hebin, **çêdibe ku sîstema pûandayînê bihê bikaranîn**. Çêdibe ku kesê (koma) xêzker ji ber xêza xwe ya baş 2 pûan, kesê (koma) rast pê derxistî jî ji ber rastpêderxistina xwe 1 pûan bi dest bixe. Kesê/koma xelet texmîn kirî 1 pûan ji dest dide û li malika wî 1 kêmek (-1) dihê nivîsandin ji bo ku îhtimala texmînkirina xelet bihê kêmkirin yan jî lîstikvan bo bersivdana piştî fikirîneka demdirêjtir bihên handan.

## LÎSTIK 3: EM DEMA GERA LI TAXA ME HEVÛDIN BIBÎNIN!

*Armanc:*

- Wekî kom, temamkirina lîstikê li gor guzergeha hatî dayîn, di rêzeka dîyarkirî da
- Piştgirîkirina fêrbûnê bi hevberkirina kartên lîstikê yên digel dîmenên li ser Nexşeya Taxa Me.
- Jibîrnekirina peyvên fêrbûyî: Gotin û tekrarkirina peyva di karta hevber da bi zimanên cuda
- Wekî kom, afirandina bûyer yan jî çîrokeka li Taxa Me û niwandina wê bi awayekî beramber.

*Kî û Kî Dikarin Lîstikê Bilîzin?*

- Her kesê ku temenê wan 8 sal û zêdetir dikare bilîze.
- Herî kêm divê 4 lîstikvan hebin ku 2 kom çêbibin.

*Melzeme:*

- Nexşeya Taxa Me ya di qutîya lîstikê da
- Qertên lîstikan

*Çawa Dihê Lîstin?*

- Nexşeya Taxa Me bi awayekî vekirî li ser maseyê dihê danîn.
- Hemû kart bi awayekî vekirî serobero li ser maseyê dihên danîn. Hemû lîstikvan, hevkartekê li ser heman dîmena di nexşeyê da cîbicî dikin. Bi vî awayî ji her kartekê hebek, bi giştî 25 kart dimîne. Ev kart, dihên berevajîkirin bi awayê ku alîyê biresim li jêrê be û li ser maseyê têra xwe dihê tevlihevkirin.
- Hemû lîstikvan li dor maseyê çend tûr digerin û cih pev diguherin.
- Lîstikvan ji hev diqetin û dibin du kom. Dîmenên di Nexşeya Taxa Me da li ser guzergeheka dîyarkirî hatine cîbicîkirin û di nexşeyê da du xalên destpêkirinê peyda dibin. Komek ji xala yekem ya destpêkirinê û koma din jî ji xala duyem ya destpêkirinê dest bi lîstikê dike. Her kom mecbûr e guzergeha xwe bişopîne.
- Bi lîstika kevir, kaxez û meqesê dihê dîyarkirin ka kîjan kom dê dest bi lîstikê bike.
- Lîstikvanekî koma dest bi lîstikê kirî hewil dide hevbera dîmena ewil ya li ser guzergeha koma xwe ji nav kartên pişta wan lê ye peyda bike.
- Her lîstikvan di her tûrê da xwedî heqekî tenê yê kartzivirandinê ye.
- Armanca herî muhîm ya lîstikê berdewamîya dorbidor e. Bi vî awayî, lîstikvan heger karteka din veke li şûna karta ku di guzergehê da dora

wê hatî, kom dê nikaribe berdewam be. Kartê cardin dizivirîne û dor dihê ser koma din.

- Lîstikvan heger dîmena rast peyda bike û ji bo ku berdewam be di vekirina kartan da, endamên komê peyva di karta hevber da herî kêm bi 2 zimanên cuda dibêjin. Lîstikvan, kartê li ser heman xêza di nexşeyê da cîbicî dike.
- Komên di du xalên destpêkirinê yên cuda destpêkirî kengî li ser
- nexşeyê bigihijin hevûdin, hingê lîstik bi dawî dibe.
- Komên di xaleka gera taxê da rastî hevûdin hatî bi zimanên cuda silavê li hev dikin, merhebayê didin hev û destê hev digirin.

**Pêşnîyaz li perwerdekaran:** Di xala hevdîtina koman da kîjan hêmana (kîjan xêza) "Taxa Me" hebe, ji wan her du komên bi rastî jî di wê xalê da rastî hev hatî dihê xwestin ku rol û/yan jî niwandinê bikin. 10-15 dq mawe ji bo her komekê dihê dayîn. Dihê xwestin ku 3 dîmenan bibijêrin ji nav dîmenên ku wekî kom heta wê gavê li pey guzergeha xwe hiştî, di nav xwe da çîrokekê binivîsin û rolên xwe yên di vê çîrokê da bixebitin. Gava her du kom jî amade bin, di cihekî vala yê odeya xebatê da xeyal dikin ku berê jî hatine vê derê û rastî hev hatine / hev dîtine û bi vî awayî bi rolkirin û û niwandina çîroka xwe dadikevin.

Dikarin dema berî rastî hev hatinê (tiştên ku heta hatina wan qewimîne), dema rastî hev hatinê (wê gavê li kû û wekî kê rastî hev hatine, dema rastî hev hatinê çi jîyane) yan jî dema piştî rastî hev hatinê (piştî rastî hev hatinê her yek ji wan bi serê xwe yan jî wekî komî çi û çi kirine) nimayîş bikin. **Lîstika Em Dema Gera li Taxa Me Hevûdin Bibînin, bi vî awayî bi xebateka biçûk ya dramaya afirîner bi dawî dibe.**

## LÎSTIK 4: PEYDAKIRINA BI RAKETA MÊŞAN!

*Armanc:*

- Tevgerandina lîstikvanan
- Xurtkirina bikêrîya çûna ji têgihê ber bi xêzkirinê û ji xêzkirinê ber bi peyvê ve
- Bipêşvebirina bikêrîya biryargirtina hevpar, lihevguhdarkirin wekî kom

*Kî û Kî Dikarin Lîstikê Bilîzin?*

- Her kesê ku temenê wan 8 sal û zêdetir dikare bilîze.
- Herî kêm divê 4 lîstikvan hebin ku 2 kom çêbibin.

*Melzeme:*

- Kartek ji her cotê (25 heb kart)
- Du raketên mêşan (şîplax) yên plastîk bi rengên cuda yan jî darikekî dirêj yê şibî wê bihê bikaranîn.

*Lîstik Çawa Dihê Lîstin?*

- Lîstik çêdibe ku li erdê yan jî li ser maseyê bihê lîstin.
- Kartên lîstikê, bi awayê ku alîyê wan yê biresim li jorê be, li erdê dihê danîn.
- Lîstikvan li du komên yeksan dabeş dibin. Bi awayê dukomî li dor kartan bi cih dibin.
- Raketeka mêşan ji bo her komê dihê dayîn.
- Di destpêkê da ji hemû lîstikvanan dihê xwestin ku 2 deqîqeyan bi bêdengî li resiman hûr bibin.
- Birêvebirê çalakîyê resimekî di hişê xwe da dihêle û bi peyv yan jî hevokekê serçimkê (ipucu) dide komê: Bêyî ku resimî rasterast tarîf bike, têgihekê yan jî tenê peyvekê derheqê resimî da dibêje.
- Komên rûbirû bala xwe didin kartên li ser maseyê û hewil didin texmîn bikin bê ka birêvebir kîjan kartê tarîf kirîye. Birêvebirê hevokeka din jî ya serçimkî dibêje.
- Ji ber ku hewce dike bi komî biryar bigirin, kom dikare di nav xwe da biaxive û nîqaş bike. Gava komek biryar bigire, lîstikvanê wê komê yê raketa mêşan girtî, bi raketê li ser resimî dide.
- Her komek di pirsîyarekê da tenê dikare li kartekê bide.
- Birêvebir dibêje “rast” yan jî “xelet”. Koma ku pêşî li karta rast dayî bi ser dikeve, wê kartê hildide.
- Di her pirsîyarê da lîstikvanê destbiraket diguhere.
- Birêvebir piştî ku serçimkê dide, hewil dide ku koma din jî nîqaşên di dema texminkirinên navxweyî yên koman da bibihîze û kom ji hevûdin îstifade bikin.
- Gava kartên li erdê biqedin, koma herî zêde texmîna rast kirîye, dibe
- xwedî kartên herî zêde û ew kom bi ser dikeve.

**Pêşnîyaz li perwerdekaran:** Dîmenên ji bo vê çalakîyê ji nav kartan hatî bijartin, çêdibe ku bi rehenda A4 ji malpera projeyê bihê printkirin. Bi vî awayî, heger meriv dîmenên mezin dane erdê û bi raketa mêşan (şîplax yan jî darikekî dirêjtir yê wekî vê) bilîze dê bizewqtir be.

**Pêşnîyaz li perwerdekaran:** Perwerdekar gava kartan/dîmenan dîyar bike, dikare di pêşî de peyv, têgih yan jî hevokên serçimk amade bike. Ev amadekarî, di dema lîstikê da dê gelekî karê perwerdekaran hêsan bike.

Serçimk dibe ku rasterast peyvên teswîrker yên dîmenê jî bin yan jî dibe ku hevokên dîyarker yên wê dîmenê bin bi rêya bibîrxistanê. Perwerdekar bi berçavkirina komên temenan yên lîstikvanan biryar digire ka dê asta hêsanî û zehmetîya serçimkan çawa be, dê îfadeyên rasterast yan jî nerasterast tê da hebin yan na.

**Mînak:** 1- Deng derdixe.. 2- Bilez hereket dike. ... Di vir da ev kart dibe ku hem erebe, hem balinde, hem ambulans, wesayîta îtfaîyeyê be. 3- Di vê kartê da rengê sor hatîye bikaranîn. 4- Di ser tekeran ra diçe. 5- Di rewşên zehmet da em gazî dikin. ... Hin kartên dîyar li derve dihên hiştin, aniha ev kart dibe ku hem ambûlans hem jî wesayîta îtfaîyeyê be. Di lîstikê da heyecan bi vî awayî dihê domandin. Hêdî hêdî di her serçimkê da komik dihê bertengkirin û dihê kirin ku kom derheqê texmînên îhtimal da, di nav hev da biaxivin. Di her gavê da dihê payîn ku nêzî peydakirina karta rast bibin.

**Mînak:** 1- Komeka qelebalix ya mirovan li vir pêk ve  ne. 2- Li vî mekanî tenê ji bo maweyeka dimînin. 3- Li vir em dikarin biheyecan, xemgîn, aram yan jî bextewer bin... Heta vir dibe ku ev dîmen hem sînema, hem otobus, hem kolan, hem sehaya futbolê, hem jî rawestgeha otobusê be. 5- Li vî mekanî paldank peyda dibin. 6- Em dikarin li vir rûnin yan jî li ser pêyan bimînin. 7- Nimareyên paldankan û cihên rûniştinê dîyar in. Hêdî hêdî hin alternatîf li derve hatine hiştin û ji wan sehaya futbolê yan jî salona sînemayê mane... Dayîna serçimkan dewam dike...

## LÎSTIK 5: GUH BI GUH!

*Armanc:*
- Bihîstina peyvan ya bi çend zimanên cuda, telafizkirina rast ya peyvan, bipêşvebirina qabilîyeta guhdarkirinê
- Temrînkirina rastbihîzî û veguhêzanê
- Bikaranîna peyvan di nav hevokê da
- Piştgirîkirina hevgirtina navbera lîstikvanan

*Kî û Kî Dikarin Lîstikê Bilîzin?*
- Her kesê ku temenê wan 7 sal û zêdetir dikare bilîze.

*Lîstik Çawa Dihê Lîstin?*
- Lîstikvan kartên hevber dibijêrin û hejmara kartan kêm dikin.
- Kart bi awayekî vekirî yan li erdê yan jî li ser maseyê dimînin, cihên kartan baş dihên tevlihevkirin.

**Versîyon 1:**

- Lîstikvanê pêşî kartekê ji nav kartên vekirî yên li erdê di hişê xwe da dihêle. Resimê (Mînak, “Firne”) di wê kartê da nîşanî kesî nade, li guhê kesê li kêleka xwe wê peyvê bi du zimanan li pey hev dipistîne. (Mînak, “Firne – Bakery”)
- Ew jî li guhê yê li kêleka xwe vê peyvê bi du zimanan dipistîne û heta lîstikvanê dawî ev lîstik bi vî awayê guh bi guh didome.
- Lîstikvanê dawî bi dengê bilind dibêje ka çi bihîstîye û karteka weha nîşan dide ku difikire li gor ya gotina wê ye.
- Heger karta rast bibîne, ew kartê werdigire û tûra duyem ew dide destpêkirin. Karteka nû dibijêre û wê peyvê bi kîjan du zimanan bixwaze, li guhê lîstikvanê li kêleka xwe dipistîne.
- Lîstikvanê dawî heger xeletîyeka biçûk di telafiza peyvê da kiribe, çêdibe ku rastxwendina peyvê pêk ve  ji alîyê komê bihê tekrarkirin. Peyv heger hatibin rewşeka nefamkirinê, telafiza rast ya peyvan ji alîyê lîstikvanê ewil ji nû ve dihê tekrarkirin.
- Armanca lîstikê ew e ku hem meriv kêf û şahî bike hem jî li guhdarkirin û telafizê bixebite,   hewil bide texmîna rast peyda bike.

**Versîyon 2:**

- Lîstikvanê pêşî yê lîstikê dide destpêkirin, kart / peyvekê dibijêre (mînak “Firne”). Hevokeka derheqê vê peyvê da saz dike û vê hevokê li guhê hevalê li kêleka xwe dipistîne. Mînak: “Xwişka hevala min li

firneyê dixebite." yan jî "Nanên firneya li taxa me gelekî xweş in."

- Lîstik her wekî mînaka ewil guh bi guh dewam dike. Lîstikvanê dawî hevoka bihîstî bi dengekî bilind dibêje. Hewil dide texmîn bike ka ew hevok di nav wan kartan da aîdî kîjan kartê ye. Karta nîşan dayî, heger ew kart be ku lîstikvanê destpêkê ew girtiye, bersiva rast peyda kirîye. Ew lîstikvan radihije kartê û tûra duyem ew dide destpêkirin.
- Lîstikvan di vir da dikarin hevokên xwe bi awayekî metelhêlayî (şaşırtmacalı) bibijêrin. Mînak, hevoka "Vê sibehê bi otobusê çûm supermarketê" bi awayekî rast bigihije heta lîstikvanê dawî jî, ev hevok dibe ku ji kartên li erdê aîdî hem Supermarketê, hem Otobusê, hem jî Rawestgeha Otobusê be. Loma lîstikvanê dawî dibe ku di texmîna xwe da bixelite. Di wê rewşê da, lîstikvanê ewil yê ku kartê dibijêre, bi serçimkekê alîkarîya lîstikvanê texmînker dike. Di vê lîstikê da ne perwerdekar lêbelê lîstikvan serçimkan peyda dikin. Lîstikvanê kartbijêr bi zêdekirina serçimkan ra, dibe alîkar ku lîstikvanê dawî karta rast texmîn bike. Mînak, heger lîstikvanê ewil bi hildana karta Supermarketê hevoka "Vê sibehê bi otobusê çûm supermarketê" saz kiribe, lîstikvanê dawî piştî bilêvkirina hevokê dikare hevoka "Em diçin wir ji bo ku çîkolatayê bistînin" bibêje ji bo ku bibe alîkar ew karta rast texmîn bike. Bi vî awayî lîstikvanê dawî fam dike ku karta rast ne Otobus yan jî Rawestgeha Otobusê lê Supemarket e. **Bi xebata serçimkan hevgirtina navbera lîstikvanan tê piştgirîkirin.**

## PÊŞNÎYAZA MIN YA LÎSTIKÊ

Piştî tetbîqkirina Lîstika Hişî ya Pirzimanî bi çend caran, heger pêşnîyazên we yên lîstikê yan jî çalakiyê hebin, hûn dikarin hema li rûpelên "**Pêşnîyaza Min ya Lîstikê**" yên li jêrê zêde bikin. Bi vî awayî hûn dê pêşnîyazên xwe yên lîstikê pêşkêş bikin ji bo perwerdekar û birêvebirên çalakiyê yên ku dê piştî we lîstik û kitêbokê bi kar biînin.

**Pêşnîyaza Min ya Lîstikê 1:**

**Pêşnîyaza Min ya Lîstikê 2:**

# KUNYE

## KOMA FÊRBÛNA PIRZIMANÎ – LÎSTIKA HIŞÎ YA PIRZIMANÎ

**Fikir û Tetbîqkirin:**
Solveig Esman - RAA Berlin
Michaela Hieke -LaKI
Jule Pfeiffer - Spiekermann - Pinselfisch,
Ece Saka – Lêkolînera Serbixwe, Perwerdekar

**Metin:**
Ece Saka – Lêkolînera Serbixwe, Perwerdekar
Michaela Hieke -LaKI
Jule Pfeiffer-Spiekermann -Pinselfisch

**Îlustrasyon:**
Jule Pfeiffer Spiekermann – Pinselfisch

**Dîzayn:**
Esra Göksu | www.esragoksu.com

**Koordînasyon û Tetbîqkirin:**
Beril Sönmez (Anadolu Kültür)
Birte Neumann (LaKI)
Ekin Su Birinci (Anadolu Kültür)

**HIŞYARIYA YASAYÎ DERHEQÊ LÎSANS û HEQÊN TELÎFÊ ya LÎSTIKA HIŞÎ ya PIRZIMANÎ da:**

Lîstika Hişî ya Pirzimanî li gor şertên xwarê çêdibe ku bihê jêzêdekirin û belavkirin:

- a. Lîstik gava ku bihê bikaranîn, jêzêdekirin û parvekirin, divê kes û saziyên (lîsansorên) navê wan di kunyeyê da wekî referans bihên nîşandan..
- b. Di bikaranîna melzemeyê da divê kunye wekî referans bihê nîşandan, divê bihê dîyarkirin ka guhertin di melzemeyê da hatîye kirin yan na. Agahîyên referansî û guhertinê yên bo kunyeyê, bi şertê ku fambar be, bi her awayê maqûl dikarin bihên dayîn. Lê di dayîna van agahîyan da, divê ew întiba nehê çêkirin ku kes û sazîyên xwedî lîsans piştgirîya we yan jî ya bikaranîna we dike.
- c. Bikaranîna ne-ticarî - Lîstika Hişî ya Pirzimanî çênabe ku bi armancên ticarî bihê bikaranîn, jêzêdekirin û belavkirin.
- d. Berhema li ser hatî karkirin, çênabe bihê belavkirin - Lîstika Hişî ya Pirzimanî yan jî melzemeyên di nav qutîya lîstikê da heger ji nû ve bihên sererastkirin, guherandin yan jî rasterast li ser wan bihê karkirin, halê guhertî yê melzemeyê çênabe ku ji alîyê kesên sêyem ve bihê jêzêdekirin, belavkirin yan jî ragihandin.
- e. Hikimê îlawe yê astengker çênabe bihê bikaranîn - Çênabe hikimên îlawe yan jî prosedûrên teknîk bihên bikaranîn ku hema tetbîqeka bi destûra lîsansê bi awayekî yasayî li kesekî din qedexe dike.
- f. Kes û sazîyên navê wan di kunyeyê da, nikarin van heqên we betal bikin heta ku hûn li gor şertên lîsansê tevbigerin.

Ji bo agahiyên zêdetir, hûn dikarin di ser malpera projeyê ra bi me ra peywendî danin:
www.hep-beraber.org | www.alle-zusammen.org

Înîsîyatîfa Hevkarîya Elmanya-Tirkîyeyê ya di Warê Piştgirîya Penaberan da

Bi hevkarîya

ANADOLU KÜLTÜR

Kommunale Integrationszentren
Landesweite Koordinierungsstelle

Bi piştgirîya

STIFTUNG MERCATOR